Gilîzank

Bilind Mihemed

Dêmê xwe ji kaxezê veke,
tîrojkên te li ser textê reş vedjenin,
sivyanoka te ji sapîtkan sil
di gel Santakulos peyaseka befrîn
di canê eşqa min de bike û
peyameka dîn
ji naxeka pir êtûn
ragehandina cûtbûna du giyanan e
ha, çavên xwe yên zil
ji dêmê xwe yên baranî
bi rû yê min yê westiyayî ve
nehêle hil
te got li kî ve hev du bibînin!?
bilajektorên cadan rûs di çavan de wêne dibin
bêje şeva te nêrgizî be û
xwe ji dûr vederke
mamiza li geliyê dilê min bêhin vedayî
hêj ez û tu zarokbûyîn
me pîrozî li hev du dibarandin û
ser sala bikin şahî
hilkin find û şemalan
mala bikin ronahî

werin gelî zarokan
gazî bikin hevalan
salek nû li me helat
bikin şahî û govendan

em zarokên birêz in
hemû bi xeml û xêz in
ciwan û rind û xweşkok in
hem bo miletî hêz in

ev lavije, ev stiran e,
ev awaze li serê min de dubare ye û
di singê min de gazî te dike
ji te hez dikim
ji te hez dikim
ha şaha min…
li ku derê bû
dilê min hêlîna eşqa te ye û
gilîzankên min vedikin